# Abstracts

## Nation-State Building Process and Kurdish Resistance in Turkey

This article mainly aims to explore dynamics of nation-building process in Turkey with focusing on the Kurdish resistance in a period covering 1920s to 1960s. Capacity of the Turkish State to consolidate ideological, military, economic and political power on the Kurdish Region of Turkey is examined based on the theoretical framework proposed by Michael Mann. The relation between despotic measures of the Turkish State toward the Kurdish resistance is analyzed in relation to the practices of the Turkish State intending to transform the Kurds into Turkish national identity. Moreover, the alliance between the Kurdish elites and the Democrat Party government in the 1950s resulted with reproduction of infrastructural power of the elites within the Kurdish society. The relations between the state bureaucracy, the bourgeoisie and agricultural landowners in Turkey have also determined the links between the Kurdish society and the Turkish State especially after the late 1950s.

## "Social Development" as a Governmental Strategy in the Southeastern Anatolian Project

This study examines the emergence and transformation of social development as a governmental strategy within the Southeastern Anatolia Project (GAP) in the 1990s. GAP, which emerged as an infrastructure project to build dams, irrigation canals and hydroelectricity stations in the Tigris-Euphrates river basin in the 1970s, was transformed into an integrated development project in the early 1990s in which social development was a significant concern. In the late 1990s, under the impact of the shifting of the glob-

al development practice from state-led to market-led models, GAP adopted the discourse of "sustainable human development," which entailed a novel notion of "social development" reconfigured in accordance with the neo-liberal development practices. Since the 1960s, governmental regional development concerns in Turkey were intermingled and became an instrument of managing the Kurdish population which since the early Republican era has had a tense relation with the state. Thus, in the GAP case, dealing with the Kurdish question has become the most significant rationale for the governmental efforts to bring social development to the east. Therefore the notion of "social development" GAP entailed should be considered as a governmental strategy set forth as a means of the governmental aspiration to manage the population living in the region. Considering this relation between the regional development policies and the Kurdish question this thesis looks at the notion of "social development" within GAP through an exploration of the governmental rationalities underlying its emergence and transformation, the technologies it deployed and the processes of subject-formation it entailed. In this manner, the study aims to bring a critical approach to studies on GAP in which "development" is taken as a given entity without being subjected to criticism.

## Environmental Destruction as a Counterinsurgency Strategy In the Kurdistan Region of Turkey

This study examines environmental aspects of the conflict between the Turkish state and the insurgent Kurdistan Workers Party (Partiya Karkerên Kurdistan or PKK). Since the early 1990s, several civil society groups have claimed that the Turkish army burned forests and destroyed other livelihood resources in the Kurdistan region of Turkey as it evacuated settlements. This study reports the results of a case study of destruction in Tunceli, eastern Turkey, undertaken in order to evaluate support for such claims. The geospatial techniques in case-specific approaches to the study of armed conflict had been used for this purpose. Through the analysis of satellite images, this study verified eyewitness reports and confirmed that substantial burnings did indeed take place in the study area between 1991 and 1994. It is argued that this destruction was not irrational or wan-ton, but that it was part of a strategy used by the Turkish army in the early 1990s that aimed at actively transforming the war environment.

## Forced Migration in Turkey during 1980s and 1990s and its Social Outcomes

The forced migration which took place in 1980s and 1990s and which was the one of the most important social phenomenon of 1990s brought about crucial socio-political changes for Turkey. For this, forced migration became the subject of political assessments and many researches. Poverty in the

urban areas, unemployment, extensive number of children in the streets, unexplained women suicides and some other social problems are altogether directly or indirectly outcomes of forced migration. Kurdish question which was often seen in an ethno-political axis is now seen also as a social question after the forced migration. In this article, how the social outcomes of forced migration became visible during 1990s and in the present day are being discussed.

**Motherhood and Politics: Lessons from Peace Mothers**

This paper seeks to discuss the role of the "mother" identity via the case of Peace Mothers, in the process of politization of Kurdish women. The mobilization of mothers whose children were subjected to state violence or to abuse of rights for a variety of reasons, relying on the "natural" legitimacy rooted in being a mother, and their entrance into the political sphere with which they had not been familiar are main focus of the study. How individual attempts having the aim of saving / finding a child evolved towards collective action, how the pain experienced brought women a collective identity, and how the struggle process transformed the mentality of the mothers are the basic questions which must be though with concepts of "agency" and "politization" of women.

**Neoliberalism and Kurdish Question in Turkey: The Case of Tuzla Dockyards**

Salience of the Tuzla Dockyard Region in Istanbul has been over the death of workers caused by the bunch of dynamics emerging from the relations of production. There are a significant number of Kurdish workers in Tuzla Dockyards as a result of forced and involuntary migration from the Kurdish Region to Istanbul which occurred due to the armed clash between the PKK (Worker's Party of Kurdistan) and the Turkish State. This study considers Tuzla Dockyards as a case which can elaborately be understood by analyzing the period that witnessed the consolidation of neoliberalism in Turkey due to its changing the character of hegemonic project in Turkey. In the last 30 years of Turkey, serious waves of political and economic hegemony crises emerged as a result of the national economic crises embedded in neoliberal transitions and counter-hegemony struggle raised by the Kurdish movement against the Turkish State. The proletarianization of the millions of Kurds can be considered as an outcome of migration waves which creates cultural/ethnic division of labor by placing the Kurds at the bottom of job hierarchy in Istanbul. In the same vein, the reproduction of ethnic solidarity among the Kurds emerges as related with discriminative discourses and practices against the Kurds by other ethnic groups. This study also focuses on the working class struggle in Tuzla Dockyards and delineates dynamics harming on the solidarity of the working class via traditional soci-

etal networks which is embedded within the post-Fordist relations of production. Overall, by relying on the in-depth interviews conducted by the Kurdish workers in Tuzla Dockyards, this study attempts to develop an insightful understanding for one of the most crucial phenomenon in the recent period.

**The First Wave in the Kurdish Migration Movements of 20th Century: The Resettlement of Kurds and the Problem of Kurdish Refugees**

This study focuse on the Turkification policies of Committee of Union and Progress (İttihat ve Terakki Cemiyeti) over Anatolia and Kurdistan during the First Imperialist War and analyses the "resettlement" process experienced by the Kurds in this period. The First Imperialist War where Ottoman Empire also participated provided heaven-sent possibilities and opportunities for the members of Committee of Union and Progress for accomplishing their plans on building a new state and nation. During the war, for creating a "Turkish Motherland" in the remaining Ottoman lands, members of Committee of Union and Progress entered into an engineering practice with mathematical calculations over demographic structure and attempted to make whole population Turk and make Turkish presence dominant over the whole reign. Within the context of this Turkification practice which has Islamic references, non-Moslems were exposed to ethnic cleansing activities and were banished from the country by an exclusionist policy. During the same period, Kurds which were Muslim but non-Turkic were forced to migrate to Turkish populated areas within the existing borders and faced with "resettlement" policies. After the completion of "deportation" of Armenians in the April of 1915, a Kurdish "deportation" came into force in May of 1916. Kurds which fled from the Van, Bitlis, Erzurum provinces and Erzincan sanjak which were occupied by Russia during that period, were settled in Turkish populated provinces and districts with a proportion of %5 and they were banned from returning their homelands. This "resettlement" policy which was implemented during the merciless conditions of war cost hundred thousands of Kurds' lives. This study focuses on this historical period and brings up this "resettlement" policy which aimed to nationalize-Turkify both the human and the space but overshadowed by "Armenian Deportation" into discussion with new documents deciphered from Prime Ministry General Directorate of State Archives Department of Ottoman Archives (Başbakanlık Osmanlı Arşivi or BOA) and Prime Ministry General Directorate of State Archives Department of Republic Archives (Başbakanlık Cumhuriyet Arşivi or BCA).

**Early Modern Ethno-politics:**
**Şerefhan's Şerefname and the Kurdish Beys**

This article will examine the text of the Şerefname written by Şerefhan-i Bitlisi at the of the 16th century. It will argue that although it represents a

manifestation of the Kurdish identity, it cannot be described as nationalist in the modern sense of the word. Rather it is an expression of the politics and identity of the Kurdish Bey class that dominated Kurdistan during this period. Furthermore, while defending the noble history of the Kurds, the Şerefname expresses a concept of Kurdishness which envisages the Kurds as a community of princes rather than a popular ethnic group. Moreover, far from expressing the desire for an independent Kurdish state, it stresses the affinity of the Kurds with the Ottoman political system."

# Kurtasî

## Avabûna Netewe-Dewletê Li Tirkiyeyê, Berxwedana Kurdan û Dînamîkên Veguherînê

Ev gotar li ser berxwedana kurdan a di navbera salên ji 1920'an heta 1960'an de disekine û armanca wê, lêkolînkirina dînamîkên avakirina neteweyê ya li Tirkiyeyê ye. Kapasîteya dewleta tirk a wê demê ya ku li Tirkiyeyê li ser herêma kurdan hêza xwe ya bîrdozî, leşkerî, aborî û siyasî bi cî bike di çarçoveya teorîk ya ku Michael Mann derdixe pêş de tê lêkolînkirin. Pratîkên zordar ên ku dewleta tirk li hember berxwedana kurdan sepandiye bi hewldanên dewletê yên ku kurdan veguherînin nasnameya netewî ya tirk re têkildar tê lêkolînkirin. Li derveyî van, di salên 1950'yan de hevkariya di navbera elîtên kurd û desthilatiya Partiya Demokrat de bi ji nû ve afirandina hêza xwe ya binesaziyê ya di civaka kurd de ya elîtên kurd bi encam bûye. Têkiliyên di navbera xwediyên axê û çîna birjûva ya li Tirkiyeyê û bûrokrasiya Dewletê de, bi taybetî jî ji dawiya salên 1950 û şûn de bûye konjuktureke dîrokî ya ku têkiliyên di navbera dewleta tirk û civaka kurd de diyar bike.

## Pêşveçûna Civakî Wek Stratejiyeke Rêvebirinê Di Projeya Başûrê Rojhilata Anatoliyê

Ev tez derketina holê û veguherîna "pêşveçûna civakî" ya ku di salên 1990'î de di Projeya Başûrê Rojhilatê Anatoliyê de wek stratejiyeke birêvebirinê hatiye pejirandin vedikole. GAP di salên 1970'yî de wek projeyeke binesaziyê ku tê de li herêma Firat û Dîcleyê avakirina hinek bendav, coyên avdanê û santralên hîdroelektrîkê hebûn derket holê. Di serê salên 1990'î de wek "projeya pêşveçûna têkel" ku tê de pêşveçûna civakî mijareke girîng bû hat veguherandin. GAP, di dawiya salên1990'î de ji bin bandora pêşveçûna ku bi destê dewletê pêk tê derket, ket bin bandora modela pêşveçûna kurewî ya

ku bi destê piyasayê pêk tê û li gor pêdiviyên pêşveçûna pêkhatinên neolîberal ji nû ve hat veguherandin û vegotina "pêşveçûna mirovî ya domdar" ku rengê "pêşveçûna civakî" jî tê de hebû hat pejirandin. Li Tirkiyeyê nêzikahiyên hikûmetan ên pêşveçûna herêmî, li gor kontrolkirina gelheya kurd ku ji destpêka Komarê de bi rêveberiyê re di nav têkiliyeke aloz de bû teşe girtin û bûn navgîna vê yekê. Ji ber vê yekê GAP jî bû mînaka ji bo bi pirsgirêka kurdan re derketina serî, pêşvebirina civakî ya Rojhilatê. Ji ber vê yekê pêşveçûna civakî ya ku di nav GAP'ê cih digirt, divê wek stratejiyeke rêvebirinê ya dewletê ya ji bo kontrolkirina gelheya kurdan a li herêmê bê dîtin. Ev tez ji têkiliya pirsgirêka kurdan û polîtîkayên pêşveçûnê derdikeve rê. Li ramanên rêvebirinê yên ku di bingeha derketina holê û veguherîna têgiha pêşveçûna civakî ya GAP'ê de, teknolojiyên ku hatine bikaranîn û pêvajoyên ku xwestine kirar-pêkanîn derxin holê dinirxîne û vedikole. Bi vî awayî ev tez bi nêrîneke rexneyî li xebatên ku bêyî têgiha "pêşveçûn"ê rexne bikin bi giştî nirxandine yên li ser GAP'ê hatine kirin dinihêre.

## Xerakirina Hawirdorê Wek Stratejiya Kontrgerîlla Li Kurdistana Bakûr

Di vê gotarê de bandora pevçûnên di navbera hêzên ewlekariyê yên tirk û Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) de ya li ser hawirdorê tê nirxandin. Ji serê salên 1990'î ve hinek saziyên civakî yên sivîl dibêjin ku artêşa tirk li Tirkiyeyê li herêma Kurdistanê daristanan dişewitîne, li wargehên ku vala kiriye çavkaniyên debarê tune dike. Ji bo ku ev angaşt bên nirxandin encama lêkolîneke qadê ya der barê xerakirinên li Dêrsima li rojhiatê Tirkiyeyê di vê gotarê de cih digirin. Di lêkolînên pevçûnên çekdarî de teknîkên jeowusatî li gor xweseriya bûyerê jî tên bikaranîn. Bi riya analîzên dîmenên peykê bi şahidiyan hatiye sererastkirin ku di navbera salên 1991 û 1994'an de li qada lêkolînê şewatên berbiçav pêk hatine. Di vê gotarê de tê angaştin ku ev texrîbat bêsedem û deraqil nîn in, li gor stratejiya artêşa tirk a ku di salên 1990'î de dixwest herêmê bike qada şer in.

## Dayiktî û Siyaset: Tiştên Ku Dayikên Aştiyê Hînî Me Dikin

Ev gotar, di pêvajoya polîtîzebûna jinên kurd de, li ser mînaka Dayikên Aştiyê, rista nasnameya "dayik"ê nîqaş dike. Mobîlîzasyona van dayikên ku zarokên wan bi şîdeta dewletê re rû bi rû mane an jî bi sedemên cur be cur mafên zarokên wan hatine binpêkirin û rewatiya "xwezayî" ya dayikbûnê û daketina wan a qadeke siyasî ya ku jê re xerîb in mijarên ku ev gotar li ser disekine ne. Mijarên wek hewldanên takekesî yên ku zarokê/a xwe bibînin, xilas bikin çawa vediguherin çalakiyeke kolektîf, êşên ku tên kişandin di nasnameyeke kolektîf de dayikan çawa digihîne hev û pêvajoya şerê çekdarî ya heyî feraseta dayikan çawa vediguherîne, bi têgihên wek "temsîliyeta" jinê û "polîtîzebûna" wê pirsên bingehîn ên ku divê bê fikirîn in.

**Koçberiya Zorî ya Salên 1980 û 1990 Li Tirkiyeyê û Encamên Wê**

Koçberiya zorî ya ku di navbera salên 1980 û 1990'î pêk hatiye, diyardeyeke herî girîng ya salên 1990'î ye û bêguman li Tirkiyeyê bi xwe re gelek guherînên civakî û polîtîk pêk anîne û bûye mijara nirxandinên siyasî û birrek lêkolînan. Xizaniya li bajaran, bêkarî, li kuçeyan hebûna ev qas zarok, xwekuştinên jinan ên ku sedemên wan nayên ravekirin û gelek pirsgirêkên civakî rasterast an ne rasterast wek encamên koçberiya zorî li pêşberî me ne. Ev yek sedemên wek pirsgirêkeke civakî girtina dest a pirsgirêka kurdan a ku wek pirsgirêkeke etno-polîtîk tê nirxandin jî rave dike. Di vê nivîsê de encamên koçberiya zorî ya ku di tevahiya salên 1990'î de pêk hatiye û îro jî çawa tiştekî berbiçav e nîqaş dike.

**Li Tirkiyeyê Neolîberalîzm, Meseleya Kurdan,**
**Herêma Tersaneyan a Tuzlayê**

Hatina rojevê ya Herêma Tersaneyan a Tuzlaya Stenbolê, piştî mirinên karkerên ku bi sedema hin dînamîkên ji têkiliyên hilberînê derketine ye. Bi sedema şerê çekdarî yê di navbera dewleta tirk û PKK'ê de, di encama koçberiya bi dara zorê û bê dil ya ji herêma kurd a ber bi Stenbolê ve de li Tersaneyên Tuzlayê hejmareke mezin a karkerên kurd hene. Ev xebat bi sedema rûyê projeya hegemonîk a ku guheriye, bi lêkolînkirina dema ku neolîberalîzm hatiye bicîhkirin wê hewl bide ku Tersaneyên Tuzlayê fêm bike. Tirkiye di 30 salên xwe yên dawî de, di veguherînên neolîberal û di encama krîzên aborî yên neteweyî yên di bin têkoşîna hegemonyaya dijber a ku dewleta tirk li hember tevgera kurd daye destpêkirin de bi krîzên polîtîk û aborî yên hegemonyayê re rû bi rû maye. Proleterkirina bi milyonan kurdan, di hiyerarşiya kar a Stenbolê de kurdan di herî jêr de bi cî kiriye ev jî dikare wek encameke pêlên koçberiyê yên ku kedê bi çandî û etnîkî kiriye tebeqe bê dîtin. Bi heman awayî ji nû ve avakirina piştgiriya etnîkî ya di navbera kurdan de, bi gotin û pratîkên cudaker li hember kurdan û komên etnîkî yên din têkildar derdikeve holê. Ev xebat di heman demê de, li ser têkoşîna çîna karkerên tersaneyên Tuzlayê disekine û bi riya têkiliyên civakî û kevneşopî yên di têkiliyên hilberînê yên Post-Fordîst te pênasa dînamîkên ku piştgiriya çîna karker xera dikin, dike. Wek encam, li gor hevdîtinên ku bi karkerên kurd yên li tersaneya Tuzlayê bi pûtepût hatine kirin, ev xebat hewl dide ku yek ji bûyerên civakî yên herî girîng ên dema nêzik, li ser Tersaneyên Tuzlayê nêrîneke ku asoya vebike bîne.

**Pêla Yekem Di Bûyerên Koçên Kurdan A Sedsala 20'em: Ji Nû Ve Cihyarkirina Kurdan û Meselya Kurdên Pênaber**

Ev xebat di dema Şerê Yekem Yê Parvekirinê de li ser polîtîkaya tirk-kirina Kurdistanê û Anatolya Navîn a Cemiyeta Terakî û Îtîhatê disekine û di wê demê de pêvajoya "ji nû ve cihyarkirina" kurdan dikole. Şerê Yekem Yê Parvekirinê yê ku Împaratoriya Osmaniyan jî tevlî bûye ji bo ku îtîhatî planên

xwe yên avakirina netewe-dewleteke nû pêk bînin merc û dertetên nedîtî derxistiye holê. Îtîhatî di hemû Şerê Parvekirinê de xwestine ku li ser axa Osmanî ya ku di dest de maye de bi armanca avakirina “Welatekî Tirk” li ser avaniya demografîk bi xebatên endazyarî yên bi hesabên matematîkî, erdnîgarî û gelheyê bikin tirk û hebûna tirk di hemû qadan de serdest bikin. Di bin banê vê xebata tirk-kirinê ya ku bi referansa îslamî tê kirin de, yên fileh bi siyaseteke redkirinê avêtine derveyî sînoran, bi paqijiya (tunekirina) etnîkî re rû bi rû mane; kurdên ku ne tirk in û lê misilman in, di nav sînorên heyî de ji bo herêmên ku zêdetirî wê tirk in hatine koçberkirin û polîtîkaya “ji nû ve cihyarkirin”ê li ser wan hatiye ferzkirin. Di nîsana 1915’an de piştî ku “tehcîr”a li ser ermenan hate temamkirin, di gulana 1916’an de “tehcîr”a kurdan xistine dewrê. Kurdên ku ji bajarên Erzirom, Bilîs, Wan û ji sancaxa Erzincanê yên ku ketine bin dagirkeriya rûsan reviyane vegera wan a ser axa xwe hatiye qedexekirin û li bajar û bajarokên ku tirk lê zêde ne bi qasî ji sedî pênc hatine belavkirin û bicîkirin. Ev polîtîkaya “ji nû ve cihyarkirin”ê ya ku di bin şertên gelek giran de hatiye meşandin bûye sedema windakirina jiyana bi sedhezaran kurdan. Ev xebata ku li ser vê dema dîrokî ye bi belgeyên nû yên ji Arşîva Komarê ya Serokwezîriyê û Arşîva Osmanî ya Serokwezîriyê, ev polîtîkaya “ji nû ve cihyarkirin”ê ya ku di bin siya tehcîra ermenan de tevî mirovan, dike ku cih û war jî bike neteweyî û tirk û ji nîqaşê re vedike.

**Etno-Siyaseta Serdema Modern A Zû:**
**Şerefnameya Serefxan û Mîrên Kurd**

Di vê gotarê de dê Şerefnameya ku di sedsala16’emîn de ji aliyê Şerefxan ve hatiye nivîsandin tê vekolîn. Şerefname her çiqas berhemeke ku nasnameya kurdan derdixe holê ye jî, di gotarê de tê angaştin ku bi nêzikahiyeke modern wek neteweperwer nikare bê nirxandin. Şerefname ji netewperweriyê zêdetir, nasname û siyaseta mîrên kurd ên ku wê demê li Kurdistanê desthilatdar bûne datîne holê. Bi van re berhem qala dîroka pak a kurdan dike û têgiha kurdayetiyê ne wek gelê kurd lê wek koma mîrên kurd bi kar tîne. Dîsa berhem di şûna daxwaza dewleteke kurd de dilxwaziya di nav pergala polîtîk a osmaniyan de cihgirtinê tîne ziman.